# Wiha ji navenda penaxwazan neqil dibî bajarekî

Berî ku neqil bibî bajarekî, piştrast bike ku îqameya te bo herî kêm salekê ye û hejmareke te ya kesî ya fînlandî heye.

Hejmara kesî adeten hingê didin te gava ku îqame werdigirî. Hejmara kesî li ser karta îqameyê hatiye nivîsîn. Hejmara kesî ji dema jidayikbûna te û çAr hejmarên kesî pêk tê. Eger hejmareke te ya kesî tine be, pêşî wê li gor şîretên Daîreya Dijîtal û Nifûsê dawa bike.

Agahiyên zêdetir: dvv.fi/ulkomaalaisen-rekisterointi (bi fînlandî)

## 1. Dawa bajarvaniyê ji Daîreya Dijîtal û Nifûsê (DVV) bike.

- Eger parastina demkî dabe te, bi formeke elektronîkî dawa bajarvaniyê bike: lomakkeet.dvv.fi/lomakkeet/6888/lomakkeet.html (bi fînlandî)
- Eger parastina navneteweyî dabe te, bi formeke elektronîkî dawa bajarvaniyê bike: lomakkeet.dvv.fi/lomakkeet/6888/lomakkeet.html (bi fînlandî)
- Eger nikarî forma elektronîkî bi kar bînî, dikarî li xizmetgeheke DVV dawa bajarvaniyê bikî.
- Gava ku te forma elektronîkî tijî kir, here xizmetgeha DVV bo xwenasandinê (bo wergirên parastina demkî ne hewce ye). Pêşî demekê bigire: dvv.fi/ajanvaraus (bi fînlandî)
- Gava ku bajarvaniya te hat qeydkirin, DVV ji te re emailekê yan nameyekê dişîne. Ji navenda xwe ya penaxwazan re bibêje gava ku bajarvaniya te hat qeydkirin.
- Agahiyên zêdetir: dvv.fi/kotikunta (bi fînlandî)



## 2. Li xanî bigere.

- Piraniya daxuyaniyên xaniyan li ser internetê ne.
- Dikarî ji her dera Fînlandayê li xanî bigerî.
- Li bazara xaniyan hîlekar hene. Bi çavekî rexnegirî li wan navbeynkaran binêre yên ku alîkariya peydakirina xanî pêşkêş dikin.
- Eger bi xwe nikarî xaniyekî peyda bikî, dikarî dawa alîkariyê ji navenda penaxwazan bikî.
- Herwiha mirov, nas û rêkxistinên cuda hene ku dikarin alîkariya te bikin xaniyekî peyda bikî.
- Eger dawa alîkariya kirê ji Kela bikî, piştrast bike ku kirêya xanî li gor sinorên kirê yên Kela ye.
- Agahiyên zêdetir bo nimûne: infofinland.fi/fi/housing/rental-home (bi fînlandî)

### 3. Xwe li ba daîreya kardîtinê qeyd bike.

- Divê ku tu xwe wek bêkarekî karxwaz qeyd bikî daku hinek alîkariyên ji Kela wergirî.
- Eger ne hewceyî alîkariyên Kela yan xizmetên pêşxistina kardîtinê bî, ne hewce ye ku xwe li ba daîreya kardîtinê qeyd bikî.
- Agahiyên zêdetir û xweqeydkirina wek bêkarekî karxwaz: tyomarkkinatori.fi/henkiloasiakkaat (bi fînlandî)



### 4. Dawa karta Kela û eger hewce be, alîkariyên Kela bike.

- Gava ku neqil bibî bajarekî, mafê te yê wergirtina pereyên alîkariyê bi dawî dibe.
- Eger hewce be, dikarî ji Kela bo nimûne dawa alîkariya bingehîn, alîkariya kirêya xanî û mafên malbatî bikî.
- Divê ku dawa karta Kela bikî. Gava ku te karta Kela wergirt, tu aîdî sîstema ewlehiya civakî ya fînlandî yî û dikarî tezmînatê bo kirîna dermanan wergirî.
- Bo tijîkirina formên Kela dikarî ji navenda penaxwazan dawa alîkariyê bikî.
- Dikarî herwiha demeke ji xizmetgeha Kela bigirî bo meşandina karên xwe. Di dema demgirtinê de bibêje eger terciman hewce be.
- Agahiyên zêdetir: kela.fi/ulkomailta-suomeen (bi fînlandî)

### 5. Dawa karta nasnameyê ji polîs bike.



- Karta nasnameyê hewce ye bo nimûne bo vekirina hesabeke bankê.
- Divê te nîşana bajarvaniyê hebe berî ku bikarî dawa karta nasnameyê bikî.
- Dawa li polîsxaneyê nike. Bo dawakirinê divê te wêneyekî pasportê yan koda wêneyê hebe.
- Eger hewce be, dikarî bo mesrefan dawa pereyê wergirtinê yê temamker bikî.
- Agahiyên zêdetir: poliisi.fi/nain-haet-henkilokorttia (poliisi.fi) (bi fînlandî)

### 6. Hejmareke bankê ya fînlandî veke.

- Karta prepaid ya Daîreya Koçberan di xizmeta te de ye 2 mehan piştî ku tu neqil bûbî bajarekî. Berî dema bidawîhatinê pereyên xwe jê derxe yan ji kartê neqil bike ser hesaba xwe.
- Dikarî ji bankê kodên banka înternetî wergirî ku pê bigihî xizmetên înternetî (bo nimûne Kela, Bac, xizmetên kardîtinê, xizmetên tenduristiyê).

### 7. Gava ku te xaniyek dît:

- Têkilî bi xwediyê xanî re deyne û here li xanî binêre.
- Eger hewce be ji Kela dawa temînata kirê bike: kela.fi/toimeentulotuki-mihin-menoihin (bi fînlandî)
- Peymana kirê îmza bike û li gel xwediyê xanî li ser roja barkirinê li hev bikin. Berî îmzakirinê peymanê bixwîne û piştrast bike ku agahiyên tê de rast in.

- Dawa peymaneke elektrîkê û temînata malê bike.
- Agahiyên zêdetir: infofinland.fi/fi/housing/rental-home/tenancy-agreement (bi fînlandî) û infofinland.fi/fi/housing/housing-problems (bi fînlandî)

## 8. Daxuyaniya barkirinê bide.



- Gava ku roja barkirinê piştrast bû, daxuyaniya barkirinê bide DVV û Postê.
- Dikarî daxuyaniyê li ser înternetê yan bi formeke kaxezî li xizmetgeheke Postê yan DVV bidî.
- Agahiyên zêdetir: posti.fi/muuttaminen/muuttoilmoitus (bi fînlandî)

## 9. Bar bike xaniyê xwe.

- Paqijkirina dawiyê li xaniyê navenda penaxwazan li gor şîretên navenda penaxwazan bike. Kilîlên xaniyê xwe yê kevn vegerîne navenda penaxwazan.
- Çawaniya rewşa xaniyê nû li gel xwediyê xanî berî barkirina xanî yan yekser piştî barkirinê piştrast bike.
- Eger wek mînak bo neqilkirina kelûpelên xwe bo xaniyê nû hewceyî alîkariyê bî, demeke baş berî barkirinê li gel navenda penaxwazan li ser mijarê biaxive.



**Piştî barkirina bajarekî:**

- Dikarî şîret û nesîhetan ji xizmetên koçberan yan xizmetgeha hevpar ya bajarê xwe bipirsî.
- Kela di mijarên debarê de alîkariya te dike.
- Dikarî alîkariya kardîtinê û bicihbûnê ji xizmetên kardîtinê yên bajarê xwe wergirî.
- Ji hingê pê ve dikarî xizmetên tenduristiyê ji navenda tenduristiyê ya nêzîkî xwe wergirî.